



ΕΛΛΗΝΙΚΗ ΔΗΜΟΚΡΑΤΙΑ

Υπουργείο Μετανάστευσης & Ασύλου

Daxûyaniya Girîng

Ji bo karûbarê Daîra Mafê Penaberiye

Daîra Mafê Penaberiye dixwaze ji bo ên li jêr gel agahdarbike:

1. Hemî qertên serlêdanên parastina navnetewî ku li gorî xala 70 a qanûna 4636/2019 derketibûn û **ji 1'ê Hezîranê 2020 heta 30 Îlonê 2020an dema wan bidawîbûne û nehatibûn nuhkirin, dema wan heta 1 Cotmehê 2020an tê dirêjkirin.**

2. **Qertên serlêdanên parastina navnetewî ku di dema karûbarê daîra penaberiye hatibû bi paşxistin dema wan bidawî bibû, yanê qertên ku dema wan di navbera 13 Adarê 2020 û 31 Gulanê 2020an da bi dawî bibûn, dema wan şeş(6) mehan ji roja ku dema wê bidawî bûye li gorî biryarnameya Wezaretê TT9028/2020 (Rojnama hukumetê B 1854/15.5.2020) hatine nuhkirin. Ji kerema xwe re xwediya van qertên serlêdanên parastina navnetewî, **di dawiya şeş mehan da bila werin bo nuhkirinê.****

Piştî dirêjkirina dema şeş mehan, ji bo serlêderên mafê penaberiye ên paragrafa 2an, dirêjkirina paragrafa1 êdî bo wan ne derbasdare.

3. A dawîn, roja Duşemiyê 15/6/2020 û pêve Deriyê Karûbarê Dîjîtal ê Wezaretê Koçberî û Penaberiye vekiriye (<https://applications.migration.gov.gr>). Li vir serlêderên parastina navnetewî dikarin hindek karûbarê xwe ê îdarî pêkbînin.